Bidestveanîna mafên neteweyî yên gelê Kurd di çarçoveya Îranek Demokratîk û Federal de

Hejmar: 129
19'ê Şibata 2010
Buha: 150 Tûmen

agiri

Duheftînameya siyasî, civakî, çandî û hunerî

Partiya Demokrat ya Kurdistana Îranê diweşîne

**Roja Cîhanî a Zimanê Zikmakî**

21'ê Şibatê(2'ê Reşemê), ji aliyê Yoniskoyê've weke roja cîhanî a Zimanê Zikmakî hatiye diyarî kirin. Lê li Îrana pir netewî, pir zimanî û di bin siya reş a Komara Îslamî de, netewên ne fars û yek ji wan jî netewa kurd ji mafê xwendina bi zimanê zikmakî hatine bêpar hiştin.Tim bi çavek bixeterî û gef mêzeyî zimanan kiriye. Lewre bi armanca helandin û jinavbirina zimanên netewan û bi taybet yê kurdî, ji her alavek serkutê mifah standiye. Agirî di riya parastin û geşandina zimanê kurdî de bi tu awayî xemsarî nekiriye û nake jî.

# Cîhan Ji Rewşa Mafê Mirov Li Îranê Hat Haydar Kirin

Konseya Mafê Mirov a NY li dawîn rûniştina xwe li Jinêvê de, rewşa xirab û binpêkirina mafê mirov ji aliyê Komara Îslamî ya îranê ve mehkûm kir

Di wê rûniştinê de ku sibêdeya roja Duşemî, 15'ê şibatê destpêkir û heya 17'ê şibatê jî berdewam bû, rewşa mafê mirov li Îranê bi hûrî kete ber bas û nûnerên welatên beşdar di Civînê de, ra û pêşniyarên xwe anîn ber bas... R: 2




## Amerîka, Rûsya û Fransayê hişyarî dan Îranê

R: 3





## Îran, Rekorddarê Tepeserkarên Nûçegihanan

R: 2

**Rûpela 2**

**Daxuyaniya Hevbeş a 4 Partiyan Derheq Zimanê Kurdî...**

**Rûpela 4**

**Rapora Siyasî A Birêz Mistefa Hicrî,**



**Mistefa Hicrî**

**Rûpela 7**


**Mafê Mirovan Li Îranê**



**Ebdulla Hicab**

**Rûpela 9**

**Jan Û Êşên Vî Welatî...**



**Evîn Berçem**

**Rûpela 10**

**Birca Belek Piştî 163 Salan Li Xwediyên Xwe Vedigeriya**



**Konê Reş**

www.arsivakurd.org

# Daxuyaniya Hevbeş A 4 Partiyên Kurdistanî Bi Boneya Roja Cîhaniya Zimanê Zikmakî

Xelkê azadîxwaz ên Kurdistanê!
Mamostayên birêz yên qutabxane û xwendingehan!

Law û qutabî û xwendekarên hêja!
Roja 21'ê Şibatê, hevberî 2'ê Reşemê, ji aliyê Rêxistina Yûniskoyê ve weke roja Cîhaniya Zimanê Dayîkê hatiye diyarî kirin. Kora Giştî ya Netewên Yekbûyî jî ji bo giringîdana zêdetir bi vê rojê, sala 2008'ê Zayînî, weke sala cîhanî ya zimanan ragihand.
Giringîdan bi zamanê dayîkê, giringîdan û alîkarîkirin e bi cur bi curiya zimanî û çandî û li rastî de nîşaneya rêzgirtine ji kesatiya hemû mirovan bêy cudahîdanan. Çunku ziman yek ji stûnên nasnameya mirov e û perawêz xistina wê, tê wateya perawêz xistina mirovan û mifah nestandin ji vê sermayeya girîng a mirovî digehîne.
Her li pêwendî li gel zimanê dayîkê de li madeya 30 a Peymannameya Cîhanî a Mafê Zarokan de hatiye ku: Zarokên kêmaniyên neteweyî û ayînî, mafê rewa yên wan e ku li gor çand û nasnameya netewî- ayînî a xwe geşe bikin û divêt li hemû qonaxên jiyana wan de bi zimanê dayîkî yê xwe bixwînin û biaxivin.
**Xelkê şoreşvan û azadîxwaz ên Kurdistanê!**
Her çiqas em dibînin ku ziman wek bingehek ji nasnameya mirov tê hejmartin û bûna pirr zimaniyê li her welatekê de sermiyanek girîng e ji bo geşandin û dewlemend bûna ziman, lê mixabin li welatê pirr netewî yê Îranê de, midehê zêdetir ji 80 sala ye ku netewên akincî li vî welatî de ketine ber pêla şovenîstiya desthilatdarên zal bi ser welat de û siyaseta yeksan kirina nasnameya netewan li bin givaş û tund û tûjiyek bêmînak û dijî mirovî de dimeşe û birêve diçe.

Çarçoveya vê siyasetê li ser bingeha yek ziman, yek çand û yek netewê de hatiye danîn û bi kiryar û bi eşkere, ziman, çand û nasnameya netewên ne fars yên akinciyên Îranê ji aliyê desthilatdaran ve sivikatî bi wan tê kirin. Ji bo pêşvebirina vê siyaseta nemirovane, rejîmên zal bi ser Îranê de li meşandina tu pîlanek dijî mirovî xwe naparêzin. Ji bo rêzgirtin ji zimanê dayîkî yê xwe ku nasnameya kurdbûna me ye, ji bo pêdagirî û tekez li ser xwendin û nivîsîna bi zimanê zikmakî, hewce ye em dest bidin zincîre çalakiyan û bi hakimên tepeserkar biselimînin ku kuştin, îşkence û girtin nikare me ji daxwazên rewa yên me dûr bixe ku ew jî hakimbûn bi ser çarenivîsa me bi xwe de ye û xwendin û nivîsandina bi zimanê dayîkî jî, yek ji bingehên vê xwasta rewa û adilane ye.
Bo van mereman û bi armanca nîşandana yekrefiya gelê kurd ji derbirîna nerazîbûnê derheq bi dirêjiya vê stema naskirî, em daxwaz dikin ku li roja 2'ê Reşemê, van çalakiyên jêrîn birêve bibin:

**Li hundirê welat:**
- Qutabî, xwendekar û mamosta li vê rojê de bi kincên kurdî ve biçne qutabxaneyan.
- Li Zanîngehan de, xwendekar bi hildana pilakardên taybet bi vê rojê ku anîne rojeva vê daxwaza rewa be, bixebitin.
3: Erkê hevwelatiyên nîştimanperwer yên kurdistanê ye ku tirakt, faylên deng û reng û daxuyaniya derçû bi vê minasibetê, bi awayek berfireh bilav bikin.
**Li derveyî welat:**
- Meş û xwenîşandan li ber deriyê rêxistinên ser bi UN'ê û herweha balyozxaneyên Îranê li welatên rojava de bihên lidarxistin û tevî mehkûmkirina siyasetên rejîmê li vê derheqê de, daxwaza alîkariyê ji wan bihê kirin.
Li dawiyê de em daxwaz ji xortên netewên bindest yên Îranê dikin ku bi birêvebirina çalakiyên taybet li vê rojê de û bi hevahengî û sorbûna xwe li daxwaz û mafên rewa yên xwe ku zimanê dayîkî, yek ji wan e, bigihîjînin ber guhê xelkê Îran û cîhanê.

**-Partya Demokrat a Kurdistana Îranê**
**-Komeleya Şoreşgerên Zehmetkêş ên Kurdistana Îranê**
**-Saziya Xebata Kurdistanê**
**-Partiya Azad a Kurdistanê**

**19' Rêbendana 1388'ê rojî**
**8' Şibata 2010'ê Zayînî**

# Îran, Rekorddarê Tepeserkarên Nûçegihanan

Roja 16'ê Şibata 2010'an, rêxistineke navneteweyî a parastina azadiyên çapemeniyê ragihand ku Îran bi girtina bêtirî 90 rojnamevanan bûye mezintirîn girtîgehên rojvamevanan û rekorddarê tepeserkarên wan di cîhanê de.

Li gor rapora "Radyo Ferda" ê, Komîteya Parastina rojnamevanan ku binkeya wê li bajarê "New York"ê ye, di rapora salane a xwe de, li ser serbestiya çapemeniyê nivîsiye: "Di Îranê de heya niha 23 nivîskar û rêveberên nûçeyan di girtîgehan de ne û ew yeke Îran piştî welatê Çînê di refa duyema girtina rojnamenivîsan da cih kiriye".

Li gor wê raporê tepeserkirina rojnamevanan, piştî hilbijartina Serok Komariyê di Îranê de dijwartir bûye û Îran yek ji tepeserkerê berbilav û nemirovane dijî çapemeniyê e. Hêjayî gotinê ye ku



rêxistina Nûçegihaniyên Bêsînor, berê di daxuyaniyekê de ragihandibû ku piştî nîşandana nerazîbûnê li hember encamên hilbijartina Serok Komariyê a roja 12'ê Gulana 2009'an li Îranê de, zêdeyî 100 rojnamevan hatine girtin û zêde ji 50 rojnamevan jî neçar bûne welat bi cî bihêlin. Herweha ragihand ku vê gavê 47 rojnamevan girtî ne.

**Doma Nûçeyê rûpela 1**
Welatên Rojavayî tevî mehkûmkirina Komara Îslamî li dor neparastina mafê mirov, herwiha daxwaz kirin ku ji bo lêkolînên zêdetir derheq mafê mirov li Îranê de heyetek ji Rêxistina NY bişînin wî welatî ku bi bersiva nerênî ya nûnerê Îranê di sêyemîn roja civînê de berbirû bû.
Herwiha daxwaz ji Îranê hat kirin ku dawî bi îdama nûciwanan, kewirbaranê, kuştina xelkê nerazî, îşkence û destdirêjiyên cinsî, dadgehiyên neadîlane, destbiserkirin nerazî û rojnamevanan, ferq û cudahî danan li dijî netewên zulmlêkirî, jinan û kêmaniyên mesebî û... yên dijî mirovî bîne.
Şandek ji PDK Îranê û Kongireya Netewên Îrana Federal tevî beşdariya li civînê de, hevditin bi nûnerên welatên beşdar de kirin û belgeyên hewce derheq eşkere kirina cinayetên rejîmê xistin rojevê.
Herwiha part û aliyên siyasî û sivîl yên opozîsyona rejîmê jî bi lidarxistina meşên nerazîbûnê li pêvajoya civînê de, serbarê mehkûmkirina siyasetên rejîmê, daxwaz ji Konsoya mafê mirov kirin ku Komara Îslamî şermezar bike.

# Daxuyaniya Deftera Siyasî Bi Boneya 22’ê Rêbendanê

22'ê Rêbendana sala 1357'ê Rojî, kopika wan bizavên nerazîbûnê bû ku çend sal bû li dijî rejîma Mihemed Riza Şa serî hildabûn. Li wê rojê de rejîma paşatiyê hiloşiya, bi vê hêvî û armancê ku hemû şûnwarên stem û dîktatoriyê li ser xelkê Îranê û bi taybet netewên bêpar kirî yên Îranê nemînin û çi din xelk tûşî vê zulm û zordariyê nebin û bibin xwediyê hemû ew maf û azadiyên ku hêjayî mirovê vî serdemî ne. Lê mixabin ji ber nebûna rêberiyek demokrat, komek ji paremayîtirîn texa civakê, rêveberî girtine dest. Li encam de rejîmek paremayî li kûrahiya sedsalên derbasbûyî û bi tep û toza serdemên kewn û hizrên jengî û hişk cihê wê girt ku li dijî hemû armancên azadîxwazan û bi taybet netewên Îranê bû.

Li wê rojê ve azadîxwaz, çalakên mafên netewî, jin û tex û qatên civakê bi taybet gelê kurd bi xebat û berxwdaniya xwe dijî vê rejîma taze bi desthilat gihîştî dest pê kiriye û roj li pey rojê zêdetir hevdem li gel eşkerebûna kakila rastîn û derketina direw û fend û fêlên rejîmê, hejmara nerazî û xebatkaran zêdetir û dengê wan bilindtir bûye, bi awayekê ku zîndan, îşkence û kuştina dijberan nekarî li hewara vê rejîmê de bihê û xelkê bêdeng bike. Heya vê radeyê ku maşkanêya berhevkirî ya rejîmê bo hilbijartina gera 10'mîn gera Serkomariyê li roja 22'ê Cozerdana îsal de refa yekgirtî û milyon kesî a xelkê nerazî û dijber li Tehran û çend bajarîn din yên Îranê de rijiyane ser şeqaman û bi meşên aram û êmin yên xwe hawar û dengê mafxwazî ya xwe gihandin hemû cîhanê.

Niha 31 sal bi ser Rêbendana sala 1357'ê Rojî ve derbas dibe û xelkê Îranê li rewşekê de roja 22'ê Rêbendanê bi bîr tînin ku bizava nerazî a xelkê piştî 22'Rêbendanê ku bi navê Tevgera Kesk hatiye naskirin, piştî 8 meh tabkirina tepesrî û kuştinên hovane û bêrehmane yên desthilatê, herwiha zindî û hêvîdar li qada xebatê de maye. Alîgir û peyrewên Komara Îslamî ku rêberên reformxwaz jî li nava wan de ne û parek ji tevgerê pêk tînin, bi meremên cur bi cur û yek ji wan jî reform li rejîmê de hatibûne nav refên tevgerê. Yan wekî bi xwe ragihandin merema wan, bihêzkirin û geşandina dubare ya rejîma gendele bo rizgarbûn ji holoşînê. Madam ku li meremên xwe de serketî nebûn û li cihê rizgarkirina rejîmê, niha hêza tevgera sekolar û dijî rejîmê li Tevgera Kesk de roj li pey rojê zêdetir xurt dibe û mana rejîma wan xistiye metirsiyê, li hizra paşdekişyan ji daxwazên xwe ne. Lewre dirûşmên dijberên rejîmê li xwenîşandanan de bi siloganên pêkhateşikên dizanin û mehkûm dikin û wê para xelkê bi xapandiyê dujminên Îranê nav dibin. Herweha ew tometên ku rejîma wan li destpêkê ve heya niha ji azadîxwazan daye û bi sedan û bi hezaran kes ji dijberan xwe bi vê tawanê kuştine yan xistine girtîgehê.

Îsal li rewşekê de rêûresma bîranîna 22'ê Rêbendanê birêve diçe ku her yek ji rejîm û Tevgera Kesk bi merema xwe mijûlê amadekariyê ne bo beşdarîkirin li vê rê û resmê de.

Li rastî de bi liberçavgirtina hêza sekolar a Tevgera Kesk ew gihîştine vê encamê ku guhertin li bin siya Komara Îslamî de bi cî nahê û rizgarî ji destê vê rejîmê yek ji mercên bingehîn yên gihîştin bi azadî û demokrasiyê ye, lewre em tevî derbirîna piştewaniya xwe ji refa hişyar û sekolar a Tevgera Kesk ku li bin her tirs û pîlanekê de li hemberî hevrefên nîwrê yên xwe nahên xapandin û dirûşmên xwe li dijî tewahiya rejîmê araste dikin û ji bo giranî xistine ser tarazûya hêza vê beşê, em bawer in ku kurd û gelên zulmlêkirî yên din, li roja 22'ê Rêbendanê de li her cihekê ku bixwazin li meş û xwenîşandanan de beşdariyê bikin, dê dirûşmên xwe û bi taybet daxwazên siyasî- netewî yên xwe bilind bikin.

**Serbikewe xebata azadîxwazên Îranê**

**Neman ji bo Komara Îslamî**

**Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê**

**Deftera Siyasî**

**20.11.1388(09.02.2010)**

# Amerîka, Rûsya û Fransayê hişyarî dan Îranê

Welatên Amerîka, Rûsya û Fransayê di nameyeke havbeş de bo Ajansa Navnetewî ya Enerjiya Etomî tekez li ser nigeraniya civaka navnetewî derbarê protokolên Etomî yên Îranê kirin û daxwaz kirin ku bilez pêşiya wan bête girtin.

Wan her sê endamên hertimî yên Şêwra Ewlekar di vê nameya hevbeş de bo Ajansa Navnetewî ya Enerjiya Etomê hatiye nivîsandin ku biryara nû ya Hikûmeta Îranê bo mehandina Uraniyoma ji sedî 20, gumana li ser hewlên Îranê bo bidestxistina çekên Etomî zêde kiriye.

Her wiha Wezîrê Parastinê yê Amerîkayê Robert Gates, ragihand, “Sipaha Pasdaran ya Îranê tev desthilata Îranê bi dest girtiye, piştevaniya protokolên Etomî dike, li dijî mafên welatiyan kar dike û pêwîstiyên piştevanîkirina bi terorîzmê pêk tîne, lewma divê ku bilez pêşiya wê hêza mafyayî bête girtin”.


Ji hêla din li Tehranê Serokomarê Îranê Mehmûd Ehmedînejad hişyarî da rojava ku her welatek bixwaze dorpêçan li dijî Îranê bikar bîne, Îran bêdeng nabe û dê helwestek tund hebe.

Piştî ragihandina meyandina uraniyomê di rêjeya ji sedî 20’ê, nerazîbûnên civaka navnetewî zêde bûne û dijberiyên navbera Îran û Rojava jî ketine rojeveke nû.



www.arsivakurda.org

# Rapora Siyasî A Birêz Mistefa Hicrî, Li 8'mîn Pilînoma Komîteya Navendî a PDK Îranê De



**Mistefa Hicri**

Basa sereke ya vê Pilînoma me, ew guhertin in ku li deverê û bi taybet li Îran û Kurdistana Îranê de hatine pêş. Nevbera Pilînoma berê û ya niha 4 heta Çar meh û nîv derbas dibe. Li wê midehê de de bûyerên berbiçav li Îranê de qewimîne ku her yek ji wan li cihê xwe de dikarin li ser rewşa giştî a Îranê de karîgerî hebin. Siroştî ye ew bûyerên ku li çar mehên derbasbûyî de rû dane dê cihwarê wan li pêşerojê de jî dom hebe. Bas û guftogoyên me li vê Pilînomê de dê li vê pêwendiyê de bin. Destpêkê de emê lênihêrînek bi ser siyaset û helwestên Partiyê li wê midehê de bikin û piştre emê encamê werbigrin û bizanibin ku li gor pêşdîtinan -Her çende renge li meselên siyasî de jî rast û durust der neçin- pêşeroja Îranê dê ber bi çi aliyekê ve biçe û li pêşerojê de çi erkek dikewe stûyê me? Paşan emê basekê ji guhertinên deverê û cîhanê bikin. Lê li rastî de ya ku ji me re girîng e û em dixwazin li çarçoveya pirsên deverî û cîhanî de bînin ziman, zêde ew pirs in ku bi awayekî rasterast yan nerasterast bandor û karîgerî li ser rewşa Îranê û ya me kurdan hene. Hûn jî dê bi beşdariya xwe basa me dewlemendtir bikin.

Ger em bixwazin lênihêrînekê bi ser rewşa deverê de bikin, li heyamê wan çar pênc mehane de, Îran navenda nûçeyên cîhanê bûye – Ger em wan çend rojên erdheja Hayîtiyê lê derbikin- basên din Talîban li Efxanistanê û hinekê jî jordetir li Pakistanê de bûne. Xêncî van nûçeyên ku bi cuda li hin piropagandayên Amerîka û ji aliyê dewleta fermî ya Efxanistan û Pakistanê ve bas jê tê kirin, rastî vê yekê nîşan didin ku hêza Talîban û El Qaîdeyê ku li wê deverê de bihevre ne, her wisan bihêz in, pêşde çûne û li gel wê ku Amerîkayê 30 000 hêzên leşkirî yên din li Efxanistanê zêde kirine, lê serketinek diyar li gor nûçeyan bidest nexistine. Teqîn, êrîş û nemaze li navenda Kabulê û li cihên hestiyar de ku li bin zêrevaniya hêzên hikûmetî de ne, berdewam in û em dibînin ku ew hêza zêde jî, nekariye destkevtek wisan bidest bixe. Li Pakistanê jî serbarê wê ku hikûmeta Pakistanê li bin givaşên dewleta Amerîkayê de êrîşek berfireh kire ser devera" Wezîristan"ê ku penageha Taliban bû û têde xelkek zaf ji Taliban û xelkê sivîl hatin kuştin, parek zaf ji malan hatin wêran kirin û hezîneyek zaf jî bo Pakistanê li dûre bû, lê nekarî li wir bi vê awayî ku bi xwe çavnihêrî dikirin, Taliban ji wê deverê derbixin.

Rewşa Efxanistanê ji bilî meseleya hebûna Taliban û Elqaîdeyê û şerên wan bi hêzên rojavayî re, li warê siyasî ve jî gelek lawaz e. Yek ji wan jî, hilbijartina Serkomariyê bû ku ji ber saxtekariyan astengên zaf ji wan re derxist holê. Ji ber zext û givaşan, hilbijartin bo qonaxa duyem hat kişandin û nerazîbûnek zêde li pêvajoya hilbijartinê de ji Hamid Kerzay derket rojevê, ji ber ku aliyên rikeber û hin ji çavdêran li ser vê baweriyê bûn ku Komîsyona hilbijartinê, alîkariya Hamid Kerzay daye bona bidestxistina dengê piranî. Renge parek li bin bandor û karîgeriya vê rewşê de be ku Kerzay piştî du car nasandina kabîneya dewletê bi Parlementoyê, her du caran jî nekarî dengê serketinê bidest bixe. Li qonaxa yekemîn de nizîk bi 7 kes ji Wezîran hatin teîd kirin, li qonaxa duyem de jî çend kes û hin ji wan jî ku 7 heya 8 Wezîran dibin, hêj mane. Dawîn bûyera li deverê de jî ku em dikarin qala wê bikin, civîna welatên rojavayî bû ku roja Pêncşemî bo pêkanîna konferansekê li dor çareser kirina meseleya Talîban li Londonê civiyan. Para herî zaf ya wan basan, pêwendî bi aştbûn yan got û bêjên navbera Talîban û hikûmeta Efxanistanê ve hebûn. Bi raya dewleta Efxanistanê û ew aliyên ku li civînê de beşdarî kirine li nav Talîbanê de cinahek heye ku nermtir e û egera lihev hatina pêre heye. Lê Talibanê bi xwe heya niha tu gotinek fermî li vê derheqê de eşkere nekiriye. Lewre tu sedemek ji bo serketina vê konferansê li holê de nine ku bikare dewleta Efxanistanê bi Talîban re lihev bîne.

Li warê siyasî ve jî, herwekî me bas kir hêzên Talîban li halê pêşrewiyê de ne, yan aliyê kêm nehatine tepeserkirin. Li rewşek wiha de got û bêjên dewleta Efxanistanê ku li halê lawaziyê de ne û Talîban jî serbarê ew hemû êrîşan, lê kariye berxwedaniyê bike û pêşde biçe, gihîştina wan bi rêketinan gelek zehmet e. Naxwazim bibêjim ku sedî sed ser nagrin, lê li rewşek wisa de gelek bi zehmet û dijwar dibînim ku ew got û bêj ser bigrin.

Li vê midehê de li beşek ji Yemenê ku bi Erebistana Seûdî re hevsînor e, dewleta Yemenê jî êrîşek xurt kiriye ser Zeydiyên ku li dijî hikûmeta navendî derketine û li wan êrîşan de him Amerîkayiyan li warê teknîk û zaniyariyan û him jî hêzên Erebistana Seûdî alîkariya wan kirine, lê heya niha jî ew hêz her li Yemenê de ne, berxwedaniyê dikin û heya niha jî hikûmeta Yemenê nekariye şikestê bide wan. Li rex wê hêza dijber de Elqaîdeyê jî li vê deverê de cih girtiye û ew dever kirine bi penagehek ji xwe re, bona wê ku ji Erebistana Seûdî û welatên erebî li Kendawê de pirsgirêk û aloziyan biafirînin ku dost û hevalbendên Amerîkayê ne û ji vê riyê ve jî bikarin derbê ji hêzên Amerîkayî bidin ku bê guman Îran alîkarê wan e.

Li Îraqê de nifûza Îranê li heyamê van çend mehan de rû ji zêdebûnê kiriye. Diyare Îranê her ji rojên destpêkê ve ku hikûmeta Sedam hiloşiya, hêdî hêdî nifûza xwe da destpêkirin, bi awayekê ku niha hilbijartinên meha 3' a Parlementoyê li pêş in, rikeberanêyeke deverî li ser hilbijartina van nûneran ji bo pêkanîna ew girûp û hêzên ku her yek ji wan dixwazin nifûza xwe zêde bikin, ji aliyekê ve welatên sunnî meseb yên deverê û li serweyî hemûyan Sûriya, paşan jî Erebistana Seûdî hêza xwe xistine kar bona wê ku bikarin alîgirên xwe û hêzên Sunnî bînin ser kar û pêşiya nifûza Îranê li Îraqê de bigrin. Ji aliyê din ve jî Îran, nifûza xwe li Îraqê de ji riya ew girûpên ku ser bi Îranê ne û ew kesatiyên ku nifûza wan heye, ji Serok eşîretan ve bigre heya kesatiyên naskirî yên din bi temah û bandor danan li se wan, hewil dide ew girûpa ku li Parlementoyê de tê ser kar, ser bi Beisî û welatên Sunnî meseb nebin û ser bi Îranê bin (ku li vê derheqê de tesîr û bandora wê pir zor e). Rewşek ku heya niha pêşbînîkirin li ser zehmet e, lê li gor ew nifûza ku Komara Îslamî her ji salên berê ve destpê kiriye û li gorî ew hezîne û mezaxtinên ku kirine, karîgeriyek zêde dê hebe. Niha li gor vê refbendiyê, hemû girûp û aliyên Îraqî bi Kurd, Sunnî û Şîe ve bi ser wan hêzan de parve bûne. Her kes li girûpekê de cih girtiye û dixwaze ku meremên xwe bi cih bîne. Yanî li rastî de li cihê wê ku em bibêjin ew hilbijartin, hilbijartina xelkê Îraqê ye, divêt bibêjin ku hilbijartinek deverî ye li Îraqê de. Çunku Îraq him li warê "Soq Elceyşî"ve û him jî li warê aborî ve bo deverê pir girîng e. Her eva ye ku her aliyek dixwaze nifûza xwe têde cihgîr bike. Lewre form û çarçoveyek hikûmetî ku li pêşerojê û piştî vê hilbijartinê li Îraqê de tê ser kar, dê karîgerî û tesîrek rasterast li ser rewşa siyasî ya hemû deverê bike. Ger em wisan danên ku hêzên Beisî tevî Sunniyan bêne ser kar, dê nifûza Îranê li Îraqê de gelek kêm bikin û pêwendiya xwe bi welatên erebî û yên Kendawê de bihêztir bikin. Berevaj jî, ger aliyê din anku aliyê Îranê serketî be, dê li dijî ereban bisekine û nifûza xwe li Îraqê de xurttir bike. Diyar e vir de Amerîkayî jî bêalî ninin û niha ew jî zêde ber bi vî alî de dişkên ku hêzên Sunnî û Beisî bikaribin zorahiyê bidest bixin. Bona wê ku bikaribin nifûza Îranê kêmtir bikin. Yên ku min hetanî niha bas kirine, dixwazin vê encamê jê bigrim ku Îran li guhertinên van çend mehane de nifûza xwe xurttir kiriye û li pêşdeçûnê de ye. Rast e ku li Efxanistan û Pakistanê de piraniya hêzan ji Talîban û efxanan pêk hatiye, lê Talîban û Elqaîde hêzên dijberî Amerîkayê û hevalbendên wan in û li deverê de şer dikin.

Dema ku li dijî Amerîkayê şer dikin yanî rasterast bi qazanca Îranê tewaw dibe ku dijî nifûza Amerîkayê li deverê de ye. Lê rewşa han bi tewahî arasteya pozetîv ji bo Îranê nine, belkî Îran li deverê de û herweha li aştiya navnetewî de hin îmtiyazên nigetîv jî wergirtine. Hin ji guhertinan jî bi zirara Îranê vegeriyane ku divêt em wan jî berçav bigrin. Yek ji wan xalan, meseleya kevnar a mehandina Uraniyomê ye ku mêjdem e dest pêkiriye. Lê ger em hesaba wan 5 mehan bikin, tevî wê ku Îran li vê siyaseta bi kiryar de serketî bûye, bi vê manayê ku heya niha li bin zext û givaşên Amerîka û Ewropa de teslîm nebûye û em tu nîşaneyek ji rêketin û lihevhatinê li Îranê de nabînin. Nemaze gefên Amerîka berî meha Desamberê ku digot heya dawiya meha Oktoberê me dem jêre diyarî kiriye, ger nehête ser maseya got û bêjê û dev ji mehandina Uraniyomê bernede, mercên wan nepejirîne, dê berbirûyê tehrîm û givaşên zêdetir bibe. Me dît ku meha Desamberê jî bidawî hat û carê çi neqewimiye. Li Niyoyorkê de jî dawîn civînên girûpa 5+1 bêy tu encamekê bi dawî bûn.

Ya ku niha bas jê tê kirin heya qasekê ji sepandina tehrîman ji aliyê NY' ve, bo ser Îranê bêhêvî bûne. Lewre bas ji cezayan ji aliyê Amerîka û welatên Ewropayî ve ye, ew jî carê xuya nine ku encama wê dê çi be. Lê ceribînan derxistiye ew dorpêçên ku li ser

Îranê tên encam dayîn, rast e ku asteng û pirsgirêkan bi taybet li warê aborî ve jêre diafirîne, lê givaşek wisan bo Îranê nahîne ku li hember xwast û daxwazên welatên rojavayî de teslîm be û gotinên wan qebûl bike. Lê her wan tehrîman li asta navnetewî de Îran zêdetir xistiye ber perawêzê, anku li warê bîr û hizrên navnetewî ve Îran li xirabtirîn rewşa siyasî a xwe de ye. Heta li pêwendî li gel Rûsiyayê ku dostê aborî yê Îranê ye, li heyamê wan çar pênc mehan de çendîn car rexne ji Îranê girtiye û li ser Pirsa Navikî givaş bo Îranê anîne ku daxwaza 5+1 qebûl bike. Bêguman zext û givaşên han, ji ber wê ninin ku em bibêjin Rûsiyayê bi tewahî Îran bi cî hiştiye, belkî ji ber qazanc û berjewendiyên xwe ye ku li vê midehê de Amerîkayê jêre dabîn kiriye. Yek ji wan îmtiyazên ku Amerîkayê li vê midehê de bi Rûsiyayê daye bona wê ku Îranê bigivişîne, pêdeçûn e bi biryara damezrandina Supera Dijî Mûşekî ku li bernameya Bûş de bû li deverê de dabinê û Rûsiya jî bi vê çendê pir nerihet bû. Obama li vê derheqê de raya xwe guhertiye û Rûsiya jî li hember de pêngavekê bo givaşxistine ser Îranê hatiye pêş. Metirsiya herî mezin ku niha li rojevê de ye, tehrîma Binzînê ye bo ser Îranê ku di rojên derbasbûyî de ji aliyê Meclîsa Senaya Amerîkayê ve hat pesendkirin û niha tenê maye ku Serok Komar wajo bike. Ger ew dorpêç dest pê bike, dê givaşek pir zêde bo Îranê bîne. Renge eva girîngtirîn û karîgertirîn dorpêç be ku dikarin bixene ser Îranê. Evane ew girift û xalên nigatîv in ku ji bo Îranê tên pêş.

Meseleyek din ku Îran bi tewahî li warê bîr û raya giştî ve bêzar kiriye, ew tepeseriyên xurt û tund û tûj in li dijî azadîxwazên Îranê ku li vê midehê de hatine pêş. Herwek hemû aliyek haydar in heya niha çendîn car Amerîka li asta Serkomar ve bigre heya dem û dezgehên xwartir, Yekêtiya Ewropayê, welatên Ewropayî, Kom û Komeleyên parêzerê mafên mirov, her yek ji wan çendîn caran Komara Îslamî li pêwendî li gel van tepeserkariyan de mehkûm kirine. Wan mehkûmiyetan li warê piraktîk de tiştek bi dûre nehatiye, lê li warê bîr û raya navnetwî ve bandor û karîgeriya taybet bi xwe hene. Lewre evana bûne alîkar ku Komara Îslamî zêdetir bikewe perawêzê.

Xalek din ku bi zirara rejîmê tewaw bûye û li pêşerojê de jî dê zêdetir bi zirara wê bişkêt, vebûna deriyê Rojava û Deverê ye bi rûyê Sûriyayê de, ku ji aliyê Ewropa û Welatên Deverê de derî bi ser hatibûn daxistin û li perawêzek tewaw de asî kiribûn. Lê bi armanca dûrxistina Sûriya ji Îranê, derî li hember de vekirin û eva jî li bin bandora Amerîka û Ewropayê de bû. Sefera Beşar Esed ji bo Firansayê, paşan bo Turkiyayê, Erebistana Seûdî, yan jî serdana Serok Wezîrê Lubnanê ji bo Sûriyayê û ew aştbûna ku li rastî de nedihat çavnihêrî kirin, hemû tiştên helket ninin, ji ber ku hemû sermayegozarî ne bo dûrxistina Sûriya ji Îranê. Dûrxistina Sûriya ji Îranê, karîgeriyek girîng li pêwendî li gel guhertinên deverê de dike. Bi vê wateyê ku ger Sûriya ji Îranê dûr bikewe, dê bandor û karîgerî li ser meseleya aştiya navbera Îsraîl û Felestînê de hebe û dê bibe alîkarek baş bo welatên Kendawê ku hemû jî li dijî Îranê ne û eva jî dikare yekgirtina wan zêdetir û berfirehtir bike. Lewre hemû aliyek hewil didin ku vê meseleyê çareser bikin. Egera hatine pêş a wê haletê jî zor e ku dewleta Sûriyayê bi hêsanî dikare vê meseleyê binirxîne ku pêwendiyên bi welatên Kendawê û welatên Rojavayî re dê qazancên pêtir li peyre bin heya bi Îranê re. Çunku li warê îdeolojî, bîr û boçûn û cîhanbînî ve xalên hevbeş yên kêm li navbera Sûriya û Îranê de hene. Lê ya ku niha heye pêwendî bi meseleyên aborî ve heye. Sûriyê bingehek aborî a yekcar lawaz heye û hewcehî bi alîkariyek zêde heye. Îranê jî li vê midehê de hevkariyek baş a Sûriyayê li warê nift û hewcehiyên din de kiriye. Rojava jî dikare wan berjewendiyan ji bo Sûriyayê dabîn bike û bi vî awayî jî ji Îranê vekişînin. Evana hin xalên nigetîv in ku ji Îranê re hatine pêş û beşek ji şûnwarên nerênî yên wan niha diyar in û para din jî renge li pêşerojê de derbikevin. Vir de merema min ev e ku li berhevdanên me de waqiîyet û rastiyek heye ku li deverê de heye û me çi pê xweş be an nexweş, divêt em li ber çav bigrin bona wê ku li biryardan û nirxandinan de tûşî şaşiyan nebin. Îranê komek pêşketin hene û li vê midehê di deverê de hin poanên pozetîv bidest xistine û li hember de jî hin poanên nigetîv hene.

**Pirs û meseleyên Îranê**

Ez naçme ser derbasbûyî, belkî dixwazim basa van bûyer û guhertinan bikim ku li midehê navbera van du Pilînomên me li Îranê de hatine pêş.

Tenê ji bo bîanîn vê yekê dibêjim ku piştî binav hilbijatina Serkomariyê, durûşm li dema xwenîşandanan de gelek destpêkî bûn û bas ji wergirtina dengan û li encam de hêviya wê ku li cihê Ehmedînejad, Mûsewî yan Kerûbî bibana Serkomar û li vê çarçoveyê de bûn. Me li guhertin û bûyerên wê demê de piştewanî ji daxwazên azadîxwazane yên xelkê kir û Komara Îslamî jî derheq ew serkut û tepeseriyên ku dimeşand, mehkûm û şermezar kir. Tevî wê jî me raya xwe anî ziman ku divêt durûşm û bernameyên xwenîşandanê ji daxwazên destpêkî ve bo pêkanîna guhertinek bingehîn li Îranê de bihên guhertin ku pêkhatî ye ji guhertina Hikûmeta Komara Îslamî bi Hikûmetek Demokratîk a Federalî.

Çunku em li ser vê baweriyê ne ku li rejîma Komara Îslamî de tu guhertinek ber bi demokrasiyê nahê xuya kirin. Lewre take riya destveanîna azadî û demokrasiyê li Îranê de, ji hiloşîna Komara Îslamî ve dest pê dike. Me wê demê bûna wan durûşman û bûna rêberiyek ku binav Reformîstên Hikûmetî ku Mûsewî, Kerûbî û Xatemî bûn, bi xala lawaz a xwenîşandanan zaniye û berdewam kar li ser wê yekê kiriye ku ew durşûm bihên guhertin. Pêngav û guhertinên ku derketine holê û xwenîşandanan jî berdewam kiriye û me jî weke PDK Îranê gav bi gav li xwenîşandanan de raya xwe li vê derheqê aniye ziman, daxuyanî dane û got û bêj kirine. Yanî em li gel guhertinan çûyne pêş û li qonaxa duyemîn de jî me ragihand ku ger durûşmên wan xwenîşandanan bibin durûşmên radîkal ji bo guherandina rejîma Komara Îslamî û dabînbûna daxwazên bingehîn yên demokrasî û azadiyê, PDK Îranê dê piştewaniyê lê bike. Dema ku bigihîje vê qonaxê ku basa mafên netewî bihê kirin, wir de Hizba Demokrat alahilgir e û wekî her car alîgirê mafên demokratîk yên xelkê Îranê ye û xebata xwe dê mil bi milê xelkê Tehranê dest pê bike. Ew guhertinên ku li Îranê hatine pêş, qonax bi qonax û gav bi gav li hêla daxwaziyên me de çûne pêş. Li dawîn qonaxên guhertinan de, li xwenîşandanên roja Xwendekar û roja Aşûra de, bi awayek eşkere meseleya dijberî bi Weliyê Feqîh, dijberî bi Yasaya Bingehîn û cudahiya Dîn ji Dewletê ku her sê jî stûnên bingehîn yên Komara Îslamî ne, ji aliyê zorahiya beşdarên xwenîşander ve hatine ziman.

Dema ku ew durûşm li nav bizava Kesk de hatin ber bas, rêzbendî ji rohntir bûn. Bi wê mananyê ku ew kesên reformxwaz ên hikûmetî ku mixabin li rêberiya wê bizavê de bûn, wek: Mûsewî, Kerûbî û Xatemî dema ku durûşmên guhertina Komara Îslamî di nav piraniya xelkê de belav bû û pabend bi rêberiya wan neman û bi pêşniyazên xwe ku berdewam daxwaz dikirin durûşmên pêkhatî şikên neqîrînin, xelkê guh nedan wan û ew tûşî tirs û wehşetê kirin, lewma piştî bûyerên Aşûrayê, nîşanên paşdekişanê di wan rêberan de derketin.

Ewa ku li bin de name û nivîsok di holê de ye, em jê haydar ninin, jiber wê yekê em qezawetê nakin, lê eger li ser diyardên eşkere bipeyvin, daxuyaniya hejmar 17 a Mûsewî ye ku di wê daxuyaniyê de mesele bi tewayî cuda ne ligel xwastekên ku berê behs jê kiribûn û di daxuyaniyên din de derxistibûn holê. Piştre Kerûbî di axaftinekê de ragihand ku Ehmedînijad wekî Serok Komar dipejirîne. Ewe jî di halekê de bû ku pêştir çendîn car ragihandibûn ku bi tu awayekê Ehmadînijad û dewleta wî bi fermî nas nakin. Beşek zaf ji alîgirên Kerûbî li navxwe û derve de bas ji vê yekê dikin ku dîtin û bo çûnên kerûbî paşekişe nebûye û tu sazan û li hevhatinek têde tuneye. Bi taybetî hevjîna Mûsewî ragihand ku em sazişê nakin û xelkê ji bîr nakin. Lê bi raya min evane hemû durûşm in, unkî rastî ew e her wek ku min di gotarekê de nivîsandibû ew meseleye gelek sade ye. Şerê Mûsewî û Kerubî her mîna ku me berê jî ragihandiye, şerê azadî û demokrasiyê nebûye, belkî şer bo bidestxistina qazanc û berjewendiyên zêdetir bo xwe ne. Heta eger behs ji azadiyê jî dike di çarçoveya Yasaya Bingehîn a Komara Îslamî de. Diyar û berçav e jî ku Yasaya Bingehîn jî çi azadiyek dide rojnamevan û partiyên siyasî! Lewma Xatemî pitir ji hemûyan bi eşkere bas jê kiriye û naveşêre ku niha hikûmeta Komara Îslamî lerzok bûye, di nav xelkê de hitbara xwe ji dest daye û di asta navnetewî de jî ketiye perawêzê. Wî gotiye ku dibe em karekê bikin ku vê Komara Îslamî ku lawaz bûye, xurt û bihêz bikin. Bi qewlê yek ji wan ku min jêweye Xatemî bû, gotiye ku Komara Îslamî şemendefirek e ku li Hêla xwe derçûye û dibe em wê bixin ser hêla xwe. Evane gotinên reformxwazên hikûmetî ne û hemû di wan meselane de, rastbêj in, lê renge di tiştên din de direwan bikin. Di basa azadî, demokrasî, mafê xelkê û mafê mirov dewan ji bo ew çemkane pênaseya taybet bi xwe hene. Lê di wê yekê de hemû rast dibêjin ku dixwazin Komara Îslamî bihêz bikin, ji bo çi bihêz bikin? Cunku Komara Îslamî a Îranê di xirabtirîn rewşa xwe de (ku niha ye), hêja ji hikûmetek Sekolar pê baştirin. Yekem ji ber vê ku di warê bîr û bawerê ve hikûmetek Îslamî ye û di çarçoveya Îslamê de ye. Tevî wê çendê ku hin ji wan dibêjin ku ehkamên Îslamî yan yasaya bingehî bi başî birêve nabe, û rexne dikin. Di warê îmkanat, şiyan û desthilatê ve jî tiştek diyar e ku niha beşek zaf ji îmkanat û desthilata Îranê ya wan e. Ku waye ew, ne li warê bîr û bawer ve û ne jî li warê abûrî ve naxwazin hikûmeta Komara Îslamî biherife û li

cih de hikûmetek Sekolar bihê avakirin, ku zirara herî kêm a hikûmetek sekolar ev e ku îmtiyazan nade melayan.

Niha meseleya dadgehî kirina wan bi tawana ew hemû cinayetên ku kirine, dest biserde girtina ew hemû dahat û samana ku malê xelkê ye û bi talan birine, hemû li ser riya wan e. Kuwaye ew dê li hemberî van guhartinên bingehîn de berxwe bidin. Niha ew jî ji ber wê ku tiştek di destê wan de hebe, axaftinekê bikin û abûra wan bihê parastin, renge hikûmet hin tiştên biçûk û destpêkî bike û bibêjin ku me ew deskevtane hene.

Refbendiya duyemîn, dinav xelkê yan Tevgera Kesek de, Sekolar in ku me got hejmara wan pitir e, lê ew sekolarane ji du girûpan pêk tên.

Yek ji wan, ew in ku weke me û azadîxwazên Îranê, beşek zaf ji rojnamevanan û yên ku bawerî bi hikûmeta Îslamî nînin, dijî rejîma Komara Îslamî ne û alîgirê hiloşîna rejîmê ne û di wê çarçoveyê de çalakiyan dikin. Lê ewreformxwazên ku berê bi tu awayekê li gel ra û boçûnên me derheq rejîmê de nebûn û li ser vê baweriyê bûn ku ger di wê hikûmetê de çalakiyan bikin, guhertinek ber bi demokrasiyê dê çê bibe û ew guhertin jî herçend kêm jî be, lê baştir ji wê ye ku rejîm bi tewahî bihê hiloşandin. Rengê vê hindê dide ku beşek ji wan gihîştibine wê qenaetê ku em her ji despêkê ve bawer bûn ku Komara Îslamî guhertin guhertin bi ser de nahê û reformhilgir nine, lewma ew jî têvlî wan girûpên sekolar bin ku aligirê hiloşîna Komara Îslamî ne.

Ew girûpe ji sekolaran li gel wan reformxwazên ku ji reformên di rejîmê de bêhîvî dibin dê tevlî refên xelkê bibin. Lê xincî wan, girşpek din dinava Tevgera Kesek de hene ku bi lawaz û bêhêz dibînin, ew jî, ew sekolar in ku weke me ligel dirûşmên azadî, demokrasî, mafên wekhevî yên jinan, kedkaran û qatên din de ne. Lê heya niha mesela netewî jibo wan girîng nine û bala wan nekişandiye. Ewa jî pirsgirêkek bingehîn e ji bo me kurdan û hemû netewên din ên Îranê ku xwazyarê çarenivîsa xwe ne di warê siyasî de. Yanî eger Komek ji xelkê Îranê li pey azadî û demokrasiyê ne, ku em jî wê dixwazin, lê me cudayiyek li gel wan heye ew jî, ew e ku em xêncî azadî û mafên demokratîk, xwazyarê mafek siyasî jî ne ku pêkhatiye ji mafê dîyarîkirina çarenivîsê ku ji bo me kurdan û beşek zaf ji netewên din ên Îranê di çerçoveya fedralîzmê de hatiye ber bas. Yanî Komarekê Demokratîk a Federal di pêşeroja Îranê de, lê ji bo wê beşa opozîsyona sekolar yan her nehatiye ber bas yan jî bi awayekî lawaz e

.Niha dê balê bikişînme ser wê yekê ku em li her yek ji wan haletane de, çi pêşbiniyekê dikin. Di haletê teslîmbûna bi tewahî a reberên reformxwaz ên Tevgera Kesk de, pêşbîniya min ew e ku rejîm û reformxwazên ser bi Komara Îslamî, weke wê girûpa ku me bas kir û rêberiya wê bizavê di dest de ye, tevî wan hêzên ku li berdestê wan de ne, dê hev bigrin, hevdest dibin û yên ku niha dijî tepeseriyê ne ligel ewên ku tepeseriyê dikin, dê hev bigrin.

Çunku di wê rewşê de ragirtina Komara Îslamî ji bo wan armanca dawîn e û li ser wê xalê yekdest dibin. Her çiqas ku ew ew yekdest bûn jî di warê selîqe û hizrî ve nîne, lê ji bo parastina Komara Îslamî jî dê carê çavpoşiyê lê bikin, yan jî dê piştguh bixin heta ku rejîmê biparêzin.

Di haletek wiha de destê rejîmê vekirîtir dibe bo tepeseriya tund a opozîsyonê. Çunku ew melayên ku heta niha rexne ji Komara Îslamî hebûne, lê dema ku man û nemana Komara Îslamî di metirsiya de dibînin, bi hikûmetê re ji bo tepeseriya wê beşa opozîsyonê dê lihevbên ku dijî Komara Îslamî durûşman didin. Encama wê qonaxê jî dikare bibe sedema pêkhatina bêdengiyê ku heyamek zêde dom nake. Merema min ew nine diyar bikin ku dê çend mehan dirêjî hebe, lê demkurt e. Lê her ew rewş li pêşerojê de dikare qazqncek din pêre hebe. Qazancê wê bi wî awayî ye ku xelkê Îranê û bi taybet mesela reformxwazên hikûmetî cure, more û kesatiyên wê pêvajoyê nas dikin û êdî ew bo hertim hitbara xwe ji dest didin. Êdî pir zehmet e ku carek din xelik ji dora wan kom bibin. Bi wê wateyê ku ew hemû direwane bi wan re kirine û ew xapandine. Ew hemû durûşim dan, xelik dane kuştin, lê bi xwe jî ligel hikûmetê pêk tên. Di rewşek wisa de rêberên tevgerê, vêca çi Kesk bin yan jî navek din, rêberî di destê wan de derdikewe û dikeve dest girûpek azadîxwaz û demokrat ku dixwazin hikûmeta Komara Îslamî a Îranê bihiloşînin û azadiyan jî misoger bikin. Lê bi wî awayî jî agirê nerazîbûnên ku niha di Îranê ji ber tepeseriyên hovane hene, egera wê çendê heye ku bo heyamekê bihê bêdeng û temirandin, lê ew bêdengiye weke peşka agirê bin Xweliyê ye ku bi nermebayekê geş dibe û ew ba jî hertim heya. Çûnku nerazîbûn, şidet, serkut û... di Komara Îslamî de roj bo rojê xurttir dibin. Bi taybetî tê çavnihêrî kirin ew givaşên ku niha li ser rejîmê hene û birêvebirina gelaleya hilgrtina "Yarane" yan, egera danana hin cezayên abûrî- eger ji aliyê NY've jî nebe- ji aliyê Amerîka û Ewropayê ve zêde ye û di perawêz xistin û dûr xistina pitir a Îranê hemû bihevre dibin sedema wê yekê ku nerazîbûn li Îranê de zêdetir bibin, bêkarî û hejarî û... xurttir dibin. Ewe jî di haletekê de ye ku kargeh û fabrîka zêdetir dê bihên daxistin, kedkar bêkartir, serkut û givaş zêdetir û bi vî awayî jî çirûska agirê bin Xweliyê vedigeşe.

Di qonaxa duyemîn de, yanî piştî wê ku agir vegeşiya, tevger dê şekl û formê bigre. Di wê demê de dê bas ji azadî, demokrasî û hiloşîna Komara Îslamî pitir derbikeve holê, lê hêj mesela mafê netewî li holê de nine. Bêguman em di rewşek wisa de dê taktîka jêhatî xwe birêve bibin.

# Komara Îslamî, Zimanê Netewan Û Jînosayda Sipî



Selîm Zencîrî

Ziman, nîşan, sembol û nasnameya her netewekê ye. Ziman, endamek jîna mirov û riya derk û têgihştin ji heyînê ye. Ziman, alaya çeqandî û şekawe li ser kopika çandî ya netewan û bi daketina wê alayê jî, netew fakter û parametra girîng a nasnameya xwe ji dest didin. Ziman ji girîngî û pûteyek zaf bimifah e û him dikare li pêşvebirin, geşandin û jîna netewan de jî rolek girîng û bibandor bilîze, berevaj, bi neman û ji bîr kirina ziman, netewek jî ji nav diçe û dihele. Çûnku gelek sîstem û rejîmên dîktator di helandina netewan de ji alava ziman mifahê distînin. Bi watayek din ji bo asimîle kirin û jinav birina her netewekê çend fakter hewce ne: Yek ji wan, Bombeya Etom e bo jinavbirina fîzîkî ya wan. Duyem, jinavbirina mîratên çandî û civakî yên wan e ku ziman jî di vê çarçoveyê de cî digre û niha zêdetir ji vê riyê ve netewe tên helandin.

Eva jî bûye sedem ku zimannas hest bi vê yekê bikin û pê bihesin ku hejmarek zaf ji zimanên cîhanê ku di encama prosesa bi cîhanîbûnê û herweha bûna sîstemên paşverû, bîrtesk û pawanxwaz de ku tên ji bîr kirin yan jî xetera jinav çûnê li dora wan digere, hişdariya wan gefan dan û serbarê hemû hewl û bizavan ji bo dûrxistina siya şûm ya mirin û jinav çûnê li ser zimanan, ketine hizra diyarîkirina rojek ji salê bi vê munasibetê. Di encam de Rêxistina Yoniskoyê li ser pêşniyaza Bengladîşê di sala 1999'ê de, roja 21'ê Şibatê(2'ê Reşemê) weke roja Zimanê Zikmakî binav kir û daxwaz ji netewan kir ku li riyên diyalog û ji hev têgihîştinê ve, li pêvajoya parastina zimanên ku ji nifşên berê ve bi mîrat mane, hewlê bidin û alîkariya hev bikin.

Îran jî welatek pir netewî û pir zimanî ye û ew rengînî û cur bi curiya çandî û netewî jî li cihê xwe de dewlemendiyek e. Lê têgihîştina rejîma hakim bi ser Îranê de ne ew e. Her çend ku Komara Îslamî jî di 30'mîn rûniştina Yoniskoyê(1999)' ê de dengê erê da vê navkirinê û di Yasaya Bingehîn a xwe de jî mafê xwendin û nivîsandina bi zimanê zikmakî jê netewan jî bi fermî nasiye, lê piştî borîna sê dehsal bi ser pesend kirina madeya 15 di yasaya xwe de, hêj bi milyonan kes li Îranê de hene ku ji îmkanên xwendina bi zimanê dayîkî yê xwe ku ji mafên sereke yê her kesî/ê ye û di yasayên navnetewî de jî bi fermî hatiye nasîn, hêj bêpar in û her li hêvî û li benda bicîhatina vê xewn û armanca xwe de ne. Gelên ne fars anku gelên bindet li Îranê de ji hemû mafek siyasî, çandî û netewî bêpar mane û rejîma desthilatdar dixwaze çanda taybet bi xwe li ser gelên Îranê de bisepîne. Çûnkû her ji roja hatine ser kar a xwe heya niha, wekî gef û xeterî çav ji zimanê netewan kiriye. Bi wateyek din wê pir zimanî ya Îranê weke xizîneya menewî û çandî ya Îranê, nanirxîne, belkî di çarçoveyek ewlekarî de dibîne. Eva jî bûye sedem ku netewên zulmlêkirî yên Îranê di bin zêhniyet û hizrînek wisa de nekarin bi wî mafê xwe şad bibin.

Lê ya eyan û eşkere ev e ku li perawêz xistina çandî û hesta biyanîkirina çandî ya parek ji civakê, bi perawêz xistina beşek mezin ji civakê li aborî û berhemanînê de bi dawî dibe, tiştek ku niha li Îranê de bi başî dixuye.

Bi giştî bêparhiştina mirov ji mafê elimîn, hînbûn û xwendin û nivîsandina bi zimanê zikmakê yê wan, yek ji metodên bingehîn yên jinavbirina nasnameya netewî ye ku bi jînosayda sipî tê navbirin. Lewre divêt em ji xwe bipirsin ku erê gelo li Hizareya Sêyemîn û Sedsala 21'an de, dema wê nehatiye ku êdî em hinekê zêdetir derheq vê zulma mezin a regezperestane bi nisbet gelê mafxwarî yê xwe bifikirin û helwest û dijkiryarên eşkeretir derheq vê qetlîam û jînosayda zimanî bigrin û ji her rêyekê ve ji ziman û nasnameya netewî a xwe baştir xwedî derbikevin?

**RONÎ**

Quncikek ji bo şiroveya bûyer û babetan ji xwendevanên "Agirî" re

**Ebdulla Hicab**



# Mafê Mirovan li Îranê

Di rojên navbera 15 heya 17ê meha 2'ê, civîna 7'ê ya Konseya Mafê Mirovan a Neteweyên Yekgirtî (MMNY), li bajarê "Geneve" a Swîsê tê li darxistin. Rojeva civînê rewşa mafê Mirovan li welatên ku mafê mirovan têde tê binpê kirin e. Gelek welat, di nava wan de Îrana qetilgeha mafê mirovan jî, wê di vê civînê de li hember belgeyên ku li dij li pêwendî di gel binpê kirina mafê mirovan de hatine eşkere kirin xwe biparêzin.

Beriya civîna, nûnerên Komara Îslamî dîtinên rêjîma xwe li ser pîvanên mafê mirov u helwêsta xwe li ser wan binpê kirinin mafan ku civaka navnetewî jê neraziye dubare kir. Di wê civînê de biryar eve ku Îran bersiva rexneyên ku li pêwendî di gel binpê kirina mafên mirovan de jê hatine kirin bide.

Li ser navê neteweyên bê nûner li Îranê, wefdên Kurd, Belûç, Ereb, Turkman u Azerbaycanî di civînê de beşdar dibin heya rewşa mafê mirovan li herêmên xwe ji cîhanê re ron bikin. Rojeva sereke ya parêzerên mafên neteweyên bin deste Îranê di civîna "Genevê" de eve ku cihê huqûqî u yasaiye neteweyên xwe li Îranê zelal bikin.

Bi wê rewşê re hêvî eve ku binpê kirina mafên neteweyên bin deste Îranê di warên neteweyî, olî, siyasî, abûrî, civakî, rêkxistinî, perwerde, huqûqî, ziman u ragehandinê de hê zelal bikeve ber rojeva civaka navneteweyî. Neteweyên bê maf li Îranê, ev demek dirêje rewşa mafê mirovan li herêmên xwe xistine rojeva cîhanê. Bi taybet ji bo civîna vê carê, nûnerên gelên bin dest bi amadekariyek xurt ve beşdarî civîna Konseya MMNY dibin.

Her weha gelek sazî u rêkxistinên parêzerê mafê mirovan li Îran u derweyî Îranê mînakên zelal li ser binpê kirina mafê Mirovan li Îranê, ji civîna Neteweyên Yekgirtî re şandine. Li navxweyî Îranê re 3 rêkxistiên karkerî, bi riya nameyek hevbeş, ji Konseya Mafê Mirovan daxwaz kirine di civîna vê carê de rewşa mafê karkeran li Îrnaê bîne rojevê.

Daxwaziya wan rêkxistinan eve ku civaka navnetewî zextê bixe ser Îranê ku rê bide karkerên welat jiyanek bi rûmet, mirovane, dûr ji tirs u bizdandin hebin u li hember binpê kirina mafan u gefên li ser jiyana xwe werin parastin.

Sendîkaya Karkeriye fîrma ya Otobûshajoiya Tehranê, sendîkaya karkerên qamîşa şekir ya Heft Tepe u Yekitiya Azad a Karkeriye Îranê li pişt wê bangê rawestiya bûn. Li gor wan, yasaya Kar a Îranê riya xwe bi rêkxistin kirinê nade karkeran u gavên bi wî rengî weke xwe bi rêkxistinkirina siyasî li hember rêjîmê têne temaşe kirin.

Ji aliyê Îranê ve, serokê navenda Mafê Mirovan, Muhemed Cewad Larîcanî, beşdarî civînê dibe u helwêsta Komara Îslamî li ser pîvan u bingehên Mafên mirovan diparêze. Di civîna şeşan de nûnerên Komara Îslamî di bersiva raporên mafên mirovan li Kurdistan, Belûçistan, Azerbaycan u herêma Erebiye Ahwazê de, weke caran qurbaniyên cinayetên xwe tawanbar kirin ku li dij pîvanên rêjîmê tev digerin.

Ev car bersiva fermiye Îranê li pêwendî di gel wan raporan de wê bê ragehandin. Lewma di rojên berî destpê kirina civîna fermî de, Komara Îslamî hemû hêz u şiyana xwe ya dîplomatîk bi kar anî heya bi her şêweya ku bikare, rê nede dubare dengê gelên Îrnanê di astek weha giring u bilind de bilind bibe. Di heman demê de nûnerên rêjîmê, dubare bi gotina tiştên giştî u bi tawanbar kirina Rojava bi destwerdana karên hundirîne xwe, hewl dan raporên binpê kirina mafên mirovan ji rojevê derxin.

Encama bas u nîqaşên civîna heftemîne Konseya MMNY her çi be u Komara Îslamî bi çi awayî xwe ji ber barê tawanên xwe bawêje, yek rastiyê naguhere: Pîvan u nirxên siyasî, exlaqî u civakiye Komara Îslamî u dîtinên rêjîmê li ser maf u kerameta mirovan, bi wê felsefeya siyasî ku mirovan weke hev temaşe dike re hev nagire. Li gor têgehîştina Komara Îslamî li ser maf u nirxa mirovan, hemû mirov u civak weke hev u xwediyê nirxê berambere mirovahiyê nayên temaşe kirin. Ji wê bi der, Komara Îslamî li ciyê aştî, li hev hatin u parastina edaletê, her tim felsefeya kuştin u xwekujî diparêze u çawa bikare bi pêş dixe. Ji ber ku bi gotina pêşeng u rêberên rêjîmê du pîvanên bingehîne felsefeya hebûna wan "Cehad" u "Şehadet" in.

Ji ber wê yekê ye ku îro li Îranê, li ciyê pîvanên destûrî, silogan u hestên kom u grûpên tundajoye têkder rojeva siyasî diyar dikin. Lewma dema bas ji xebata bi rêkxistinî ji bo sererast kirin u nûkariyên siyasî tê kirin, li her alî ve duruşmên dijber serî hildidin. Şanosaziyên li pey heve rêjîmê ji bo pêşîgirtin ji nûkarî u vekirina rê ji bo beşdariya berfirawantir di dezgehên rêveberiya welat de, li gor pîvanên navnetewî weke mînaka herî berçave binpê kirina mafan li Îranê tê dîtin.

Li gel sepandina duruşm u daxwaziyên paşvero bi riya hestên beşa herî tundreve civakê, rêjîma Îranê hemû derfet u îmkanên welat jî xistiye destê hêzên serkutker. Ev hêz serbestin ku li gor xwesteka xwe çawa bixwazin, bi wî awayî rojeva siyasiye welat diyarî bikin. Êdî ne dezgehên qezayî u ne jî heta yasa u pîvanên huqûqiye dijî mafan yê rêjîmê bi xwe jî li dest wan hêzan parastî nînin. Mirov li Îrana mîlîtarîze kirî an dibe emrazê bi pêşve birina pîvan u bernameyên Komara îslamî be, an mafê jiyan jê tê zewt kirin u keramet jê re namîne.

Îrana îro bûye meydana pêşbirkiya paşverotiyê. Her yek ji mela u ayetullahên xwedî deselat li gor şiroveya xwe li dîn, mirov, ol u kulturên cuda kar dike u bi dilê xwe hêrişê dike ser wan. Îrana îro pitir dişibhe dewletbajarên serdema desleata Romiyan ku di wan de, li her bajarekê eşrafekê bi dilê xwe fermana girtin u kuştinê dida.

Li her bajarek mezine Îranê jî ayetullahek bûye mîrxezeb u bi awayek despotîk bi çi rengê bixwaze meydanê ji maf u azadiyên xelkê re teng dike. Evin ku diyar dikin ka kî bikeve dezgehên rêveberiyê, kî bê hilbijartin u kî li Îranê çi karek bike an bi çi awayî tev bigere.

Li kêleka wan, ayetullahên ku hem ayetan u hem jî Allah tenê ji bo amancên xwe yên siyasî bi kar tînin, generalên nûgîhaiye Besîc u Pasdar bi riya hêza xwe ya abûrî u serbazî, civakê kuntirol dikin. Bi saya Xameneyî u Ahmedî Nejad, ev general hem biryarên siyasî u hem kêşa hêzê li navbera deselatdaran u rexnegiran diyar dikin.

Bi hêza wan tayê terazûyê her dem bi aliyê deselatdaran ve qurs dibe. Gelê bê deshelat u opozisyona bê îmkan tenê car û bar dikarin hawarekê bikin. Kesên ku xwe weke nûnerê heq u rastiyê dizanin her demê xwe bi hêz u serketî nîşan didin.

Serbarî wê metoda birêveberiyê, Komara Îslamî bi felsefeya dijberî û dujminatiyê qet civakek azad ku mirovan têde rêz u nirxên weke hev hebin naxwaze. Ji ber ku ev li ciyê li hevhatin u bi hev re axaftinê, dijberî u dijayetiya navbera gelan, kultûran u olan diparêzin.

Kesên ku weke wan nefikirin hêjayê jiyanê nabînin, baweriya ku bi ya wan re yek nebe tune dihesibînin u xwe bi tenê nûnerê rastî u dînê rast dihesibînin. Di rewşek weha de bersiva Îranê li ser raporên mafên mirovan her çi be, tu alîkariya guhertin u baştir kirina rewşa jiyana gelên bin dest li Îranê nake.

www.arsivakurd.org

# Tundûtûjî û sedemên berdewamiya wê



Cefer Mubeşirniya

Di hemû dem û dewranekê li seranserê cîhanê de tundûtûjî mîna pirsek pir girîng û diyardeyek şûm di nav civakê de hebûye û niha jî heye. Hertim jî bas li ser wê mijarê tê kirin, lê heya niha ew diyarde didome.

Lê ya ku di çarçoveya wê mijara me de cî digre, şiroveyek kurt e li ser tundûtûjî û sebebên berdewamiya wê di malbatên kurd li Kurdistana Îranê de. Mîna gelek deverên cîhanê bi xasmanî li gor çanda kurdî eşkere ye ku goriyên wê diyardeyê, jin û zarok in. Jibo bas, şirove û têgihîştina bi durist a wî derdê giran, hewce ye bi cuda bas li ser jin û zarokan, him jî curên tundûtûjiyê bihê kirin. Eger em şidetê parveyî 3 beşan bikin, divêt bibêjin ku: tundûtûjiya devkî yan jî bi ziman, tundûtûjiya kiryarî yan jî fîzîkî û herwiha derûnî yan jî piskolojîkî. Berî her tiştî emê bas ji şideta dijî jinan bikin ku ji aliyê mêran ve tê encam dayîn û berî her tiştî bandorek pir nerênî li ser peywendiyên hewce ên jin û mêran dike. Derûnnas tekez li ser wê çendê dikin ku mifah standin ji şidetê di her demekê de dibe sedema dûriya dilan û evîna kûr bêmana dike. Di rewşek wiha de herdu alî hest bi dilsariyê dikin û riftarên wan tên guhartin, lê jiberku çanda guftûgo, şêwr û mentiqê di wê navberê de tuneye. Bi taybet deiya mêr wê iznê nade ku bihevre ji pirsgirêkên xwe re bipeyvin. Eşkere ye ku mirovên neriftar di dema pirsên siroştî ên malbatê de li gor edetê xwe dest didin kiryar û gotinên nejêhatî mirov bi awayên cur bi cur. Yek ji wan metodan jî devkî ye ku pêk tê ji dijûndan, hêcet girtinên bê sedem, hawar kirin û qîrandin, fermanên bi kerb û kîn, xwe silkirin, bêhurmetî û bê exlaqî.

Metodek din a tundûtûjiyê, azardana derûnî ye. Wek: Gef xwarin bi kuştin, telaqdan, lêdan, jin biserde anîn, veşartin û jinav birina belge ên şexsî ên ku ji bo her mirovekê hewce ne. Wek: Nasname...,tunekirina mal yan jî madiyat, pêsipardina karên ne erkê jinan, rêgirî li hatûçûya rojane, pêşgirî li peywendiyên ligel xizm û hevalên xwe, pêşgirî lixandin û peyda kirina kar û pîşe û dil pîsî.

Metoda din, kiryarên fîzîkî ye, weke: Lêdan, derkirin ji malê, hebsî kirina di malê de, qedexe kirina xwarinê û azarên cinsî.

Bikar anîna heryek ji wana li dijî jinan, tundûtûjî tê hesibandin û dibin sedema arîşeyên malbatî û nîşandana rûyek tundûtûj ji civaka kurdî derheq jinan. Qatek din a goriyên wê diyardeyê di civakê de, zarok in.




Piraniya wan şêweyên şidetê li dijî zarokan jî tên encamdayîn. Lê hin riftarên din hene ku tenê bi dijî zarokan tên bikar anîn. Di vê beşê de dixwazim îşare bi 3 meseleyan bikim ku pêtir tesirên derûnî li ser zarokan hene. Yek ji wan, zewicandina keçan di temenê zarokatiyê de ye ku di civaka me de ne tiştek nenas e. Di vê derbarê de çi behsa nebûn yan jî sêwî bûna şiyana hizrî bikin, yan jî nebûna ezmûna pêwîst a maldariyê û yan çendîn tesîrên din mîna zêde bûna pirsgirêkan li ser riya xwandin û perwerdeyê û veqetiyana yekcarî ji xwandinê, givaşên kar û erkên daykîniyê û bandora wê li ser tendurustiya wê-î zarokî, di warê derûnî de jî hestkirin bi jiyanekê nenormal di nav xelkê de ...

Mesela din ku gelek di civaka kurdî de pêş hatiye, cudayî danan di navbera keç û kuran de ye ku her yek ji wan bi taybetî keç di dema jidayîkbûnê de eger di warê cinsî ve bi dilê dayîk û bavan nebû, ew zarok ji hebîn û rehma dê û bavan bêpar dimîne, mirovek xemok jê çêdibe û di pêşerojê de tûşî nesaxiyên derûnî dibe. Ya dinê ku di malbatên sunetî de zaf rû dide, ew e ku keç di temenê biçûkî de kêmtir ji kuran tên cezadan û di temenê nûciwaniyê de berevajî wê pêvajoyê didomînin, ew jî ji bo parastinên pêşwext ên namûsî û perwerdekirina keçên şermîn e. Pirsa giring liser wan arîşane, îrorojê di sedsala 21an de ew e ku erê gelo tiştek ku hebe gerek her bimîne û bi qeder û siroştê bihê sipartin, yan ew pirs jî mîna her pirsek din di ramkirin û kuntirola mirovan de ye? Min jê waye ku piraniya wan pirsane li nezaniyê de diqewimin. Ji bo zanîn û bi şaristanî çareser kirina wan diyardên şûm, hertim tê baskirin ku ger saziyên sîvil ên taybet bi van waran bihên avakirin, dê bandorek pir baş hebe. Niha ku pêvajoya avakirina wan saziyan di civaka kurdî de cihgîr bûye, dibînin ku çalakên wan saziyan ji aliyê desthilata zal bi ser civaka me de bûne nîşan û her roj bi hêceteke wan dixin zîndanan û daxwaz ji yên mayî dikin ku li gor xwastikên wan kar bikin. Çûnku rejîma Komara Îslamî a Îranê baş dizane ku saziyên han kar li ser guherandina bîr û hizrên paremayî yên xelkê ber bi însaniyet û şaristaniyetê dikin. Rayedarên wê hakimiyetê jî ku ne mirov in û ne jî mirovahiyê fam û nas dikin, pêka pirograma xwe her pêşdeçûnekê bi xeterek mezin li ser xwe dibînin. Jiberku zêhniyet û eqliyeta sedsalên navîn ku her li çarçoveyek xeyalî û tiştên nerohn de digere ku li gel eql û hizrên serdem de nagunce. Lewre rewşa niha ya hakimiyet û tenahiyê bi taybet di warê civakî de ne tê ênkar kirin û ne jî tê tocîh kirin. Eva jî li halekê de ye ku Komara Îslamî a Îranê di zaf ji saziyên navnetewî de jî endam e. Bi giştî ew diyardeyên civakî, tiştek ninin ku Komara Îslamî yekem car anîbine nav çanda civakê, lê siyaset û zêhniyeta tund û tûj û paremayî ya rejîmê li berdewamî û xurtbûna wan diyardeyan de alîkar e û dabîn kirina ewlehî û tenahiya civakî li Îranê de dûre ji eql, mentiq û çarçoveya hizrî ya Komara Îslamî.

www.arsivakurdi.org

# Jan û Êşên vî Welatî...



**Evîn Berçem**

Jan û derd dûr nakeve ji vî welatî. Mirovên vî welatî bi xwînrijandin û bedelên giran sal li ser salan sipartine axa xwe. Car caran laş sist dibe, dem vedigere paş. Êş û jan li bedenê dikeve, dilerize, dikeve û şûnde radibe li ser xwe.

Her rojên ku ji jiyana kurdan dibuhure, dilop dilop xwîna hêvî dikevin li ser axa vî welatî. Hinek diwestin, bê mecal û neçar dimînin, hinek dikevin di nav xweînkariyê û nema bi êşa dijminan debar dikin û ji xwe direvin. Hinek berxwe didin û heta dawiyê, bi her awayî diparêzin vî welatî.

Li tenişta kenekî, li bihûşta hêviyan hemû jî ked dane ji bo vî welatî..

Daristana darun peldar hilweşiyan. Razyana stûxwar li binya çiyan de diçilmisin...

Lê, dema her bûharê dar şûnde şîn dibin, kulîlk şûnde dipişkivin û zarokên tavê şûnde tên afirandin. Hêvî efsûna bayê berbangê ye li vî welatî.

Kevir di destê zarokan de qeşa girtin. Wêneyên laşê mirinê hawîrdora vî welatî de bûne têlên sînorê. Mirovahî digrî. Şerrek berdewam dibe. Ev şer ne bi serdikeve û ne jî wenda dibe. Li hember zarokên vî welatî perçiqandina mirovahî sîper girtiye. Li meydana şerr de jî mafê mirovahî talan e..

Mirovên vî welatî ji kevneşopiya zerdeşt in, li hember mirinê rûken û bînfireh in û li hember talan kirina mirovahiyê di nav lepên xwe kevir dihillînin..

Doh li Kurdistana Bakûr kûjeran bi navê "failî meçhûl" kurdên ronakbîr, rojnamevan û ciwan tûne di kirin. Hîna jî berdewam dike girî û talan kirina kûlîlkên vî welatî...

Îroj jî li Rojhilatê eynî tişt berdewam dibe. Girtin û binçavkirin bûye mêvanê her malê. Her rojên ku ava dibe bi zilmê re difetise.

Dengê hawara. Guh didim, na, dengê giriyên me pêve tu deng dernakeve. Bê dengiyek mîna zahferan û tahmekî tirsê heye. Hozanan ahengên şînê dirijînin. Axînek ji rûpelên helbestvanan tê. Hinek ji qorzîkên cuda derdikevin û behsa çareseriyê dikin.

Ji xerîban re gazinde tê kirin, xerîb bi valahî li me meyze dike û dilê me teng dibe...

Gelo li vî welatî neçarî û kurdîtî eynî tişt e?

Dema kuştin hebe, girtin û hebs kirin hebe, mafê mirovahî bê xem û bê tirs bê îhlal kirin.. Dema rûpelê kîtêban, rêzên hevok, çîrok û dengê dilan tên qûsandin.. Dema dayîk bê çare li dû kûrên xwe meyze dikin û êdî hêsirên xwînê li ser hinarikên rûwê derd kişandî dirijînin. Axîn û girî.. Dema reng qedexe dibe. Peyv qedexe dibe. Dema nasname dibe barek û lêdan dixwe!

Navê neçariyê dibe kurdîtî?

Li dorekî cîhanê, li rojnameyekî bi zimanekî xerîb li ser rûpelên modern de çîroka me tê nivîsandin û em ji qorzîkekî meyze dikin.. Rûwê xwendevanê rojnamê diqermiçe û bi carekî re rûpel digûhere, tiştekî bêhnfireh dixwîne...

Ji kurda pêve kî dikare hilbigire êşên vî welatî?

Dagîrker bi "bêteref"î çîroka me dinivîse. Pêşî ji bejna çîrokê por diqusîne, dûra reng diguhere û hildiweşîne. Em ji qorzîkekî li wan meyze dikin. Li rojnameyekî, bi zimanekî biyan çîroka me kêm û nenas dinivîsin. Dema dixwînin, rûwê wan diqermiçe û qolinca înkar kirinê dikeve qirka wan, dikuxin!

Axxx neçarî.. kurdîtî.. Em bi êş in, her kiras li me naye. Taziye kenê vî welatî.

Tiştek dilê şevê diguvije, berbangek qetandî li ser hawîrdorê Sinê hildide.. Nema kenê keçek biçûk tê dîtin. Tirsek dilê zarokan de weke pirpirîkan ba dide.

Loma em nîvcene.. Kenê me qetandî.. Em ji stranên xemgîn hez dikin. Êş bi me nase... Hezkirin û evîn li ba me kêm e.. Em ji hêvîyan xaniyek ava dikin û mîna zarokekî bê tecrûbe dikevin hûndir.. Xanî dibe xerabe û em di nav de dîsa neçar...

Min di xewna xwe de dît, stêrkan bi tempoya senfoniya Nînovayê şewq didan li ser vî welatî.. Heyv şerm dikir ji sipehî û narîniya rondikên çavê evîndariya vî welatî. Dengek di gûhê min de diliniya, min pişta xwe dabû Zagros. Carekî xûya kir bûka azadiyê..Tisbîhek hebû di destê wê de, her kevirên tisbîhê bi rengên Lapis-Lazûlî...

Şîyar bûm, min xewna xwe kir name û nivîsand ji girtî û şehîdên azadiya Sinê re.. Nameyê min negihaşt wenda bû di himbêza bahozekî de...

Xortên Mehabadê...Kûlîlkên Sinê..Înkar kirina mirovahiyê û erdhêjên bindestiyê di dilê wan de...girtiyên hêvîyên xwe ne ciwanên vî welatî...

*Kaniya Helbestan*

# Rewşname



**Wergerandin ji Erebî: Cankurd**

Ez li derekê ji dayîk bûm
Li ser vê erdê
Li xaneke demê
Wek zayîna her mirovekî dî...
Li Kuba an jî li Koriye
An wekî zengmirovekî li Afîka...
Ez rojekê ji rojan
Bi cejna zayîna xwe şanebûm...
Ne ji ber ku ez dîroka ji dayîkbûna xwe nizanim...
Lê ji ber ku dirêjahiya jîna xwe
Ez bi axê re
û bi hevcarî re ez mam...
Wekî "Bariya" yê Hindî
û Mûjîkekî ji bakur...
û di şevan de
Ez mam bi pênûs û defteran re
û min nizanî bû çi demê dimirim
û çawa dimirim...
Ez ji jînê ho bûm nivîsandinê
û xwendinê
û ji boyî çi mar jehir dide...
Ez ji xwe re li kêfxweşiyê negerîm
Li wan çelîkên zêrîn
yên ku di çêrokan de...
Ez mijûl dibûm bi fêkiyên pîkinan
Ewên ku li baxên welatê
min...
Ez ti caran bi kêlên mirica
û bi ariyênelîstim...
Gava min ronahî dît
Di çavên royê û di ên gel de
hîngê ez zaro bûm...
û min rêya xwe qelaşt...
Min perrên rengareng
Weke yêd firindan hilnegirtin
Wekî "Kardînalên Bonnê"...
Min bihîst ku dibêjin:
"Kurê mirov nikane seriyê xwe hilgire".

û ez dibêjim:
"Cîhana me ne reştarî ye..."
Seriyê xwe deyne ser sîngê gel
Ser axê...
û dilguman nebe...!
Çem, asîman û zireyan hembbike
Bê tirs û bê dudilî...
û dilsoz bijî bi karkiran re
ewên ku rastiyê di şevan de dipên..."

"Ewên ji cîhanekeêdikanin ji hev fêhmbikin."(*)
û bawer bike, ku jîn
Ne : "Solin şil in û kok in şikestî ne, di pença pêçekan de"(**)

www.arsivakurd.org

# Birca Belek Piştî 163 Salan Li Xwediyên Xwe Vedigere




**Konê Reş**

Doh, ji bajarê Cizîra Botan ez hatim agahdar kirin ku di roja 12 Şibatê de wê artêşa tirkan bi rengekî fermî ji Birca Belek derkeve û wê Birca Belek li xwediyên xwe vegere. Vê agahdariyê gelek tişt û mişt anîn bîra min; wek ku hûn tev dizanin, Birca Belek ji sala 1847' an de, piştî dîlkirin û sirgunkirina Mîr Bedirxanê Azîzî, ketiye destê artêşa Impratoriya Osmanî de û ji hingê ve, wek bargehek leşkerî, artêşa tirkan jê desthilatdariya xwe di herêma Botan de berdewam dike.

Dîroka avakirina keleha Cizîrê û Birca Belek di gelek qunaxan re derbas dibe, vedigere heyamê Imperatoriya Guttî (4000 sal berî zayînê).. Di serdemê Imperatoroiya Sasanî de jî bi seroketiya Erdeşêr Babekyan (241-226 berî zayînê), hatiye nûjenkirin an restorekirin. Di sala 1596' an de, mîr Şerefê 2 an ji malbata Azîzan, Birca Belek û Şaneşîn di hewşa wê kelehê de ava kirine.. Birca Belek, di geşbûna xwe de, ji 366 odeyan pêk dihat û wiha di nav çerx û dewranên salan de, her mîrekî Botan ji malbata Azîzan ev Birc spartiye yê di pey xwe re û dawiya wan Mîr Bedirxan bû. Her wiha xelkên Botan, ji hêla wan Mîrekên Azîzan ve, bi hezkirina ziman û welatê xwe hatine perwerde kirin. Erê, Birca Belek ji Kurdan re di heyamê geşbûna xwe de mîna Koçka Spî bû a ku îro li Washingtonê ye ji Emerîkiyan re, hem ji wek Koçka Elîzê ye ji Fransizan re. Lê sed mixabin ku roja îro ji bilî Birca Belek gelek şûnewarên dîrokî yên din jî hene û wêran bûne, gelek cihên dîrokî hene, ku şop û şûna wan nema xuya dikin. Dagîrkeran cihên dîrokî wêran kirine, hin jî di bin ava Dicle de mane.. Gelek cih jî di bin erdê de nebedî ne, xebat û xepartin ji wan re pêwîst e.

Gelek biryarên ku di xizmeta mirovahiyê de bûn ji vê kelehê û Birca Belek hatine der wek: avakirina piran, aşan, hilanîna cudahiya ku di navbera Misilman, Xiristyan û Cihûyan de, dema ku Mîr Bedirxan ev gotina xwe a navdar got: **Dîn dînê Xwedê ye em tev birayên hev in**.. A din ew biryarên guhdana bi ilim, zanîn û zanyaran ku ji encamên wan biryaran Medreseya Sor hat ava kirin. Ev Medreseya ku di heyamê xwe de Zanko bû, kêm zanko wek wê di Rojhilata Navîn de hebûn, ew jê mîna Zankoya Elezherê a li Qahîrê bû. Û ji encamên avakirina wê zankoyê, kesên wek Îsmaîl Ebû Îz Elcezerî, Îzeddîn Îbin Elesîr, Mecddîn Îbin Elesîr, Melayê Cizîrî, Feqiyê Teyran…hatine holê ku wan jî xizmeta mirovahiyê kirine.



Eger îro piştî 163 salan, ew dîwanxaneya Mîrê Botan di Birca Belek de ji leşkerên tirkan vala dibe, gereke li xwediyên xwe yên Kurd vegere û têkeve bin parastina UNESCO de, UNESCO lê bi xwedî derkeve, wek pêmayekî şaristaniya mirovahiyê bê parastin û ji nû ve restore bibe. Bi vê helkeftê em doza wî pêmayê Bedirxaniyan dikin, ewê ku Osmaniyan di sala 1847' an de destên xwe danîn ser û birin Stenbolê, em bi hêvî ne ew pêma jî lê vegere û dawî bibe wek mûzexaneyekê ji mirovahiyê re.

Dawî dibêjim, mijde bo we va Birca Belek azad dibe.

**Heta Niha Perwerdeya Kurdî Bi Alfabeya Kirîlî Bû.**

# Li Ermenîstanê Alfebaya Kurdî - Latînî Bû Fermî

Li Ermenîstanê, kurd êdî dikarin li cihê alfabaya Kirîlî, alfabaya Latînî ji bo perwerdeya xwe bi kar bînin.

Li gorî ANF'ê, alfabaya Kurdî ya Latînî bi awayekî fermî li gundê Elegezê di civînekê de hate ragihandin. Di civînê de mixtarên gundan, midûrên xwendegehan, mamoste û rewşenbîr amade bûn.

Li vir Serokê Şêwra gelê kurdên Ermenîstanê Kinyasê Hemîd, got: "Demek dirêj e da ku zarokên kurd bi alfabeya kurdî ya latînî perwerde bibin, ew têdikoşin. Dema Yekîtiya Sovyetê pirtûkên me kirîlî bûn. Piştî hilweşandinê, 20 sal in ku pirtûkên me nedihatin weşandin. Beriya du salan me pirsgirêkên xwe ragihand dewleta Ermenîstanê. Bi saya mamoste, rewşenbîr û mixtaran, alfabeya latînî bû fermî."

Li Ermenîstanê kurdan alfabeya kirîlî ji sala 1941-ê vir ve di xwendegehan de bi kar dianî. Piştî hilweşandina Yekîtiya Sovyetê pirtûkên kurdî jî nehatin çapkirin. Piştî danûstendinên bi hikûmeta Ermenîstanê re pirtûk bi alfabeya latînî ji nuh ve hatin nivîsin. Niha ji bo polên 1 û 2'ê pirtûk hatine nivîsîn. Tê ragihandin ku ê heta pola



12'an jî pirtûk bêne amadekirin. Li Ermenîstanê heftê 3 demjmêran bi awayekî fermî perwendeyî bi zimanî kurdî dimeşe. Alfabeya kurdî ya latînî ya Celadet Bedirxan û ji 31 tîpan pêk tê.

**ŞM AKnews**

www.arsivakurd.org

# Şiroveya Gotinên Pêşiyan

**Beşa 11**



Çiya Mazî

Ji taybetiyên herduyane jî, ku ne bi wateya nazarî (a ewil) têne bikaranîn. Yanî bi wateyeke dîtir (mecaz) têne bikaranîn. Carinan gotinên pêşiyan bi wateya xwe nazarî (ewil, heqîqî, rastî) jî têne bikaranîn, lakin ev ji bo biwêjê ne gengaze. Yanî wateya biwêj her tim mecaz in. Weke gotinên pêşiyan, biwêj ne rêberin.

Ê ku wê biwêjê nizanibe, serpêhatiya wê nizanibe, tu wateyê jî jê dernaxe. Lewre her biwêjek, serpêhatiyeke û wateyeke wê yî taybet heye. Ji dudu û zêdetirî gotinan hatine ba hev; ji tiştekî, rewşekê an buyerekê re bûne nav. Yekî ku çiqas zimanzan be jî, ger wê biwêjê nizanibe, an ne bihîstibe, nizane wateya wê jî çiye. Lewre têybetiyeke biwêjê jî eve ku, bi gotineke kin û kurt meseleke dûr û dirêj tîne ziman. Weke em bibêjin (2) "Mesela baqê nîskan" Yekî ku serpêhatiya vê biwêjê nizanibe, ma dê ji vê hevoka kin çi manê derxe? Û nizanin min bi vê gotinê jî çi da fêmkirin, daxwaza min çi bû. Lê ê ku vê biwêjê zane, ew fêm dike ku min çi got û min xwest ez çi bidim fêmkirin. Vekirina vê biwêjê jî bi kêmanî du rupelan tije dike. Bi gotina (3)"çongşikestî" qesta min ne ku bi rastî, çongên wî (bi fizîkî) şikestî ne. Belkî qasta min jê eve ku "tirsiya ye qutufî ye, ji tirsan bê hal ketiye" lê bi rewşa xwe ya fizîkî sip û saxlem e.

Me got di biwêjan de, ne şîret hene, ne jî hukum ilmî heye. Ger ku di hinek biwêjan de reng şîret hebin jî, bi eslê xwe ne ji bo şîretê hatine gotin. Rewşek an buyerek dane fêmkirin, lê buye weke şîretê jî. weke em bibêjin "Apê pilo ha bêjê, qun bi qulo ha bêje" di vir de rewşekê dide fêmkirin. Ku li mirovekî pir şîret û gotin bêne kirin û ew jî tiştekî nexe serê xwe, berevajî wan şîret û gotinan tevbigere, îcar ji bo ku mirov rewşa wî bîne zimên, divê pir gotin û şitexalî bê kirin. Lê mirov bi tewreke kin û kurt, rewş û ehwalê wî mirovî bi vê hevokê tîne zimên.

Herdu jî (Biwêj û gotinên Pêşiyan), pir bi bingeh û watedar in. Gotinên pêşiyan, weke ku navên wan li ser in, xuya ye ku mirovên mezin û zana gotine, peyvên wan neqane ne, çêj û bîna pîroziyê ji wan difûr e. Dema mirov li hinek gotinên pêşiyan hûr dibe, pir li wan miştaq dimîn e, dikeve şikê ku, çewa mirova bîr û raman kirine, ev gotinên xweş, rast û durist li hev anîn e, hûna ne.

Gel jî ew heta vê demê anî ye. Lê biwêj ne wisa ne. Gotinên biwêjan pir ji rêzê ne, li hev anîn û hûnandina wan jî xweş e, lê gotin ne neqane ne, heta pirên gotinên biwêjan nelirê (mustehcem) nin. Di biwêj û gotinên pêşiyên Kurdan de paşverutî nîne, yanî, li ku, kîjan gotin pêwist û munasip be, hatiye bikaranîn, ne gotine ev peyv şerm e, ev peyv nelirê ye. Mirov kare bêje ku xwezayî ne.

Kes nikare destpêka gotinên pêşiyan bibîne. Yanî bi tevahî gotinên pêşiyan pir kevnare ne. Pala xwe didin çavnêrîn û ceribandinên jiyana hezar salan. Her yek, bi hezaran caran hatine ceribandin û dawiyê hatine gotin. Lê biwêj ne wisa ne. Ji bo biwêjan, kevn û nû ne pîvan e. Dibe ku bi hezaran sala bêrê û dibê ku di demek nêz de jî hatibin gotin. Hinek ji gotinên pêşiyan, li çend qada û hereman zêdetir bêne bikaranîn jî, di rastiya xwe de, gotinên pêşiyan netewî, heta mirov kare bêje ku navnetewî ne.

Bi tevahî, her gotinên pêşiyên neteweki, li gorî jiyana civaka wî ya sosyalî, ekomonî, çandî û derunî hatine gotin. Lê mirov ji gelên dîtir re jî wergerîne, dibe ku ew jî gelek ders û eqilan jê bigrin. Lê biwêj ne wisa ne. Dema mirov biwêjekê wergerine zimanekî dîtir, carinan tiştên ecêb û sosret derdikevin hole. Lewre herêma biwêjan teng e.

Carinan di herêmekê de, carinan di bajarekî de, carinan di qadekê de, di gundekî de, di taxekê de, di kolanekê de, di malbatekê de û carinan di nava çend bira an hevalan tenê de tê bikaranîn. Ji ber vê ye ku, em gelek caran di hinek pirtûkan de rastî gotinên pêşiyên netewên biyaniyan tên, lê em li biwêjên neteweyên biyaniyan rast nayên. An jî pir kêm lê rast tên. Gotinên pêşiyan kê gotibin bila be, ji her mirovî re pêwistin. Çimkî ji çavnêrînî û ceribandinên wan derketine û ilmî ne. Lê biwêj; encax ên ku bi serê wan de hatiye û çîroka wê bizanibe jê re lazim e. Ji xwe tu ilmîtiya biwêjan jî nîn e. Pir biwêj hene ku me, bi seatan didin fikirandin, giryandin û kenandin. Lê yekî ku ne ji herêma me, gundê me an taxa me be, tu wate û fikrê ji biwêjên me yî heremkî dernaxe, bala wî jî nakşîne. Dema ku mirov ji yekî biyanî re biwêjekê dibêje, zimanê me zanibe jî zoq dibin, li devê mirov dinihêrin.

Ji ber wataya biwêj, mecaz e.
Çi gotinên pêşiyan, çi jî biwêjên Kurdî, herdu jî pirên wan bi qafiye hatine gotin, hatine hûnandin. Ên ku ne wezin bin jî hene, lê ew jî ger ku forma wan ne hatibe qulupandin (xera kirin), hûnandina wan pir balkêş e. Weke ku hostayê dîwêr rêzên kevirên şehkirî, bi şaqul lêbike. Di tu cihan de ne nuxteke kêm, ne jî yeke zêde hebe. Ên ku formên wan hatine xera kirin jî mirov çiqas orjînalîta wê nizanibe jî, dema lê binihêre, xeta û kêmaniyên wê peyvê weke xete û kêmaniyên diwarê hoste ye.

*" Ev şîroveya Brêz Dêrsilavî, ji bo rexneya gotinên pêşiyan ên ku di salnameya Navenda Çanda Mezopotamya (NÇM Stenbol 1999) hatine weşandin û herwiha bi gelemperî li ser gotinên pêşiyên Kurdan e. Ev gotar di rojnameya Azadiya Welat de hatiye weşandin. Ji bo Gotinên Pêşiyan hê baş bê fêmkirin, min ew gotar bi guherînên biçûk û bi destûra brêz Qedrî Dêrsilavî li vir bi cîh kir. Ç.Mazî"*

**NÎQAŞA 3 NIVÎSKARAN LI SER 45 GOTINÊN PÊŞIYAN**

Van gotinên li jêr di salnameya NÇM ya 1999'an de hatine weşandin. Ji bo wate û naskirina Gotin û biwêjan baş bêne fêmkirin min bi şîroveyên xwe, şîroveyên Brêz Qedrî Dêrsilavî û yên Brêz Mistefa REŞÎD di vir de wekî nîqaşekê bicîh kir.
"*Kesê aqilmend peyvê xwe dipîve, nû dibêje*" Bi navê gotina pêşiyan hatiye weşandin. Belê ev ne gotina pêşiyan e. Lê dibe ku metelok (öz deyiş) be. Lewre tu mecaz û şîret tê de ne xuya ye. Pir tiştên din jî hene ku vê goitnê ji gotinên pêşiyan dûr dixe, lê ji bo dirêj nebe ez zêde nakim. Di gotinê de jî guhertin çêbûye. Ne "nû" divêt di virde peyva "hîn" bikarbanîna.(Q Dêrsilavî)

Ez mane û naveroka vê gotinê baş û girîng dibînim. Kesê ku hema çi ber devê wî, çat û pat lêdixe, bi rastî jî ne aqilmend e. Çiqas mirov gotinên xwe bipîve û paşê bêje, ewqas jî baş e. Pir caran ji gotinên nepîvayî serêşiyên mezin derdikevin. Ji lewre, ev gotina li jor pend û şireteke gelek baş e.

Pirsa girîng li vir ew e, ku ev gotinên pêşiyan, li gor rêz û rêzikên zimanê me rast bên nivîsandin. Bê guman, wek ku li jor hatiye nivîsandin, mirov jê fêhm dike. Lê belê li gor giramêra zimanê nivîskî divêt li cihê "peyvê xwe" awayê "peyvên xwe" bê nivîsandin. Bêjeya "nu" jî em bi awayê "nû" dinivîsînin. Lê ji aliyê semantîk vê, peyva "nû" naveroka vê pendê baş nade xuyakirin. Bi dîtina min, heke bihata gotin:

Kesê aqilmend peyvên xwe dipîve û paşê dibêje" hên baştir bû. Ev vedigere ser zimanê kesê ku ev pend gotiye, yan jî gihandiye me. Ez bi xwe ne ji wê baweriyê me, ku em bêjin, me wisa bihîstiye, divêt wek xwe bimîne û wisa em van gotinan li gor giramêrê çewt binivîsînin. (M. Reşîd).
"*Pîvaz, pîvaz e, çi serî ye, çi binî ye"* rastiya "*Pîvaz, pîvaz e, çi sor e, çi sipî ye*" yanî kok û bingeh yek in, çi gewr an jî çi esmer be. Lê ku mirov weke (çi serî, çi binî) bixwîne tu watê nade, tiştek jê nayê fêr kirin.

Ez cidahiyeke mezin di navbera herdu şêweyan de nabînim. Bi herdu şêweyan jî tê fêhmkirin, ku mebest çi ye. (M. Reşîd).
"*Bi kerê nikare, êrîşê dibe ser kurtên*" forma (qalibê) vê peyvê jî hatiye xerakirin. Rastiya wê "*Nikare bi kerê, bazdide kutan*" belkî heman wateyê didin. Lê kaîdekî gotinê pêşiyan jî ev e, ku forma wê neyê guheztin.(Q Dêrsilavî)

*"lê bi baweriya min, li gor herêman, li gor rewş û tevgera civakê, formên wan têne guherandin,lê ne ew forma ku wê ji gotinên pêşiyan bi dûr dixe. Carinan bi guherîneke kurt ew dibin biwêj an dibin gotineke pêşiyan yeke din.( Ç.Mazî)"*
"*Destê pîsîtiyê bi deriyê xwe were"* ez bawerim ji ber ku forma vê gotinê jî guhertiye, mirov nikare tiştekî jê fêr bibe. Lê ez rastiya wê nizanim. (Q Dêrsilavî)

www.arsivakurd.org

agiri

Duheftînameya siyasî, civakî, çandî û hunerî
Partiya Demokrat ya Kurdistana Îranê diweşîne

http://www.kurdistanmedia.com/kurmanci/index.php
Navenda bingehîn ya xebata Agirî li Kurdistanê ye.
Navnîşana derveyî welat:
AFK B.P. 102- 75623 Paris CEDEX 13 –FRANCE

E - Mail: agiri2003@hotmail.com
agiri2003@gmail.com, rojnamaagiri@gmail.com




## Tirkiye naxwaze pasaportên kurdî binase!



Tirkiye naxwaze pasaportên corê A yên Îraqa Federal, ku bi zimanên Kurdî, Erebî û Îngilîzî hatine amadekirin û li gor makezagona Îraqê hatine derxistin, bipejirîne. Sedema wê yekê jî bi cihdayîna zimanê Kurdî li wê pasportê de dizanin.

Li gor PNA'yê, Midûrê Şûbeya Pasaportan yê Silêmaniyê Muhsîn Osman, daye zanîn ku hemû cîhan wê pasaportê qebûl dikin, lê Tirkiye pirsgirêkan derdixîne û weha didomîne:

"Îraq welateke serbixwe ye û çawa bixwaze dikare wusa pasaportan derxîne. Wezareta Karê Derve ya Îraqê, berê jî gotibû ku ewê pasaportên Îraqê yên tîpa A, bi zimanên Îraqê yên fermî; bi Erebî, Kurdî û Îngilîzî derxînin. Li ser astengî derxistina Tirkiyê, Wezareta Derve ya Îraqê Tirkiye îqaz kiriye, lê heta niha tu bersivek negirtiye."

Li gor madeya 4emîn ya Makezagona hertimî a Îraqa Federal, Kurdî û Erebî zimanên fermî yên Îraqê ne. Heta, li gor hukmê vê madeyê, dikare li ser hemû dukomentên fermî bi Kurdî û Erebî bê nivîsandin.

## Sunetkirina keçan li Murîtanya tê qedexekirin



Li gor malpera Avesta, li Murîtanya hinek caran radeya sunetkirina keçan digihê %92. Niha Parlamentoya wî welatî hewlê dide ku biryara qedexekirina sunetkirinê derxîne.

Ji aliyê dinê, vê dawiyê girûpek ji zanyarên olî, fitwaya qedexekirinê derxistin.

Di wê fitwayê de ew zanyar diyar dikin ku sunetkirin, zirarên tendurustî digihîne wan keçan.

## Dawîn Şervanê Simkoyê Şikak Li Temenê 137 Saliyê De Koça Dawiyê Kir



Sibêdehiya roja 27.01.2010'an, hevwelatî Hemîd Ehmed Ebdula, naskirî bi Hemîde Goc, mêrê herî bi temen li Kurdistan û Rojhilata Navîn li gundê Çinaroka ser bi devera Sîdekan a bajarokê Soran, bi yekcarî malawayî ji jiyanê kir. Hemîd xwediyê jinek, 4 kur û gellek newiyan e. Li gor nasnameya warê kesêtî, Hemîd Ebdula li sala 1873'ê Zayînî li Sîdekanê ji dayîk bûye. Navhatî şervan û sowar çakekî jêhat yê Simayîl Axayê Şikak bûye û gellek serpêhatî û bîreweriyên binirx bi Simayî Axa re hebûne.

Wî bi peyatî sefera gelek ji bajarên Îraq, Îran û Turkiyayê kiriye û tim hez ji şivanetî û geryan li nav çiya û zozanan kiriye. Wekî xortên wî bas dikin, risq û xwarinên rojane yên wî, tim xwarinên kewn yên kurdî û giyayên siroştî bûne ku li devera wan de şîn dibin.

Hêjayî gotinê ye ku xwedê jêrazî heya demên dawîn yên jiyana xwe li serxwe bûye û tu car ji bo nesaxiyê seredana doktor nekiriye. Navhatî hemû temenê xwe her li gundan de qedandiye û mijûlê xwedîkirina pez û malat û heywanan bûye.

**Hewlêr**

### Li Roja Cîhaniya Valintaynê De

## Bi Hezaran Sêw Hatin Mîxekrêj Kirin



Mîxekrêj kirina Sêwê, weke edetek kevnar a kurdî li Rojhilatê Kurdistanê û bi merema hejêkirinê birêve diçe.

Li roja Valintaynê de(14/2), li 44 bajar û bajarokên Kurdistana Başûr de, pirojeya netewî kirina Sêwên mîxekrêjkirî meşiya û têde kur û keçên kurd, Sêw mîxekrêj kirin.

Piroje ji sê beşan pêk hatibû: Nîşandana kurte fîlmek bi navê"ew Sêwa dilê min bû", vekirina pêşangehek fotografiyê û mîxekrêj kirina hezaran Sêwan ji aliyê kur û keçan ve.

Seywan Seîdiyan, birêveberê pirojeyê di vê derheqê de ragihand ku Sêwa mîxek kirî, ew Sêw e ku dema xwe bi du armancan bikar hatiye. Yekem gava ku kur yan keçek aşiq bûye û nekariye evîna xwe bîne ziman, lewre Sêwek mîxek kirî jêre şandiye. Duyem, li dema hêrsbûnê de ji bo aştbûnê ew Sêw dihat bikar anîn.

Hêjayî gotinê ye ku biryar e 5000 Sêwên mîxek kirî weke hêmaya 5000 şehîdan ji Helebçê ve bo Hîroşîmayê bihên veguhastin.

www.arsivakurd.org